



Vê zivistanê Wales'ê ewle xwedî bikin.



Zanyariyên girîng ser Koronavayrusê

Pêdiviya me hemûyan heye arîkar bin
berbelavbûna li Wales'ê rawestînin.

Çawan xwe û malbata xwe ewle xwedî bikin



DESTÊN XWE BI RÊKPÊKÎ BIŞON

Bi taybet eger hûn çûbin
kîrînê, bestekê hildabe yan
xwarînê hildin.




DEVPÊÇÊ LÊDIN

Li her derê ku pêwîst e.



XWE CUDA BIKIN

Eger hûn yan kesek ji malbatê
xwedanê nîşaneyan in, yan
eger şopînerê pêwendiyê
daxwaz dike, li malê bimînin.



JI HEV DÛRBÛNÊ BIDOMÎNIN

Ji kesên din ku di qada we ya
malbatê de nînin 2metreyan
bi dûr bin.



NÎŞANEYAN NAS BIKIN

Nîşaneyên sereke yên
Koronavayrusê taya zêde, kuxika
nû ya berdewam û jidestayîn yan
guherîna hîsa tehmê yan bêhnê ne.

TESTÊ BIDIN

Demildest telefon bikin
119 yan **testeka**
înternetî rezerv bikin

eger nîşaneyên we hene – hetanî
eger navgîn bin.



ARÎKARIYA ŞOPÎNERÊN PÊWENDIYÊ BIKIN

Eger hûn bi kesekî xwedanê testa
erênî di tîkiliya nêzîk de bûbin,
şopînerên pêwendiyê dê ser tewsiyeyê
ji we re telefon bikin. Ew dê tenê
telefon bikin ji **02921 961133**.

PÊWENDIYA XWE BI KESÊN DIN RE KÊM BIKIN

Baş bifikirin hûn diçin ku û bi kê re hevdîtîne
dikin. Her çiqaşî cihên pirtir biçin û kesên pirtir
bibînin, bi taybet li hundir, pirtir ihtimal heye
Koronavayrusê bigirin û kesên din pê bixin.



SEPANA NHSÊ JIBO KOVÎD-19 WERGIRIN

Ew rêyeke zû ye mirov
bizane hûn ber metirsiya
Koronavayrusê de ne yan
na. Wê ji App Store yan
Google Play daxînin.



RIHETIYA WE

Hûn di rewşeke dijwar de ne. Ji her demê girîngtir e li tenduristiya mêjî
û rihetiya xwe muqate bin. Hûn dikarin tewsiye û arîkariya belaş werbigirin
bi riya serdana **www.callhelpline.org.uk**, yan telefonkirina **0800 132 737**
yan şandina peyva: **HELP** bi riya kurtenameyê jibo hejmara **81066**.

NHS HÎN JÎ BO WE LI VIR E – ARÎKAR BIN KU EM ARÎKAR BIN

Renge vê zivistanê rêya xwe gihandina NHS cuda be lê hîn jî dema
pêdiviya we hebe li vir e. Bi raçavkirina demên hevdîtînan, û bikaranîna
xizmeta rast bo nexweşî yan birîna xwe arîkariya NHS bikin.

Eger pêdiviya we bi arîkariye hebe lê lezgîn nîne, serdan bikin
https://111.wales.nhs.uk. Yan telefon bikin bo jimareya **111** bo
wergirtina tewsiyeyê, an bi Bijîşka Giştîya xwe yan dermanxaneyê,
an bijîşkê çawan yan diranan re pêwendiyê bikin.

Bo zanyarî û tewsiyeyên dawîn ser Koronavayrusê li Wales'ê, ji kerema xwe serdana malpera Hikûmeta Wales'ê bikin **www.gov.wales/coronavirus**

Heke hûn bixwazin, ev nivîsok bi formatê din jî tê pêşkeşkirin:
E-name: **stomerhelp@gov.wales**, telefon: **0300 0604400**



Llywodraeth Cymru
Welsh Government

Peyamek ji Wezîrê yekem ê Wales'ê

Sala 2020 bo me hemûyan dirêj û dijwar bû. Koronavayrus
siyêke dirêj xist ser jiyana me hemûyan, û hîn jî dawiya vê
pandemiya mirinê diyar nîne.

Eger em hemû bi hev re bin, em dikarin ser rêya ku vê vîrûsê
daye pêş xwe guherîne bikin – û em ê bikin jî.

Me îsal ji her kesî daxwaz kiriye karên derasayî bikin, û
fedakariyên derasayî bikin, ku hemû ewle bimînin.

Ez ji we daxwaz dikim kirina van hemû karan bidomînin.

Ev vîrûsek e ku bi pêwendiyên mirovan mezin dibe. Eger em
bixwazin vîrûsê kontrol bikin, divê tûşbûnê kêmkirin bikin.

Her cara ku em bi kesekî re hevdîtîne dikin, metirsiya pêketin
yan pêxistina vîrûsê heye.

Ji ber ku Krîsmes nêzîk dibe, ji kerema xwe baş bifikirin hûn diçin
ku, çi dikin û kê dibînin.

Ev dê arîkariya we bixwe, malbat û hevalan bike ewle bimînin.

Bi hev re em dikarin Wales'ê Ewle Bihêlin

Sipas,



Mark Drakeford

Mark Drakeford MS,
Wezîrê yekem ê Wales'ê